فرضت الحادثة نفسها على العديد من ثقافات الشعوب بمختلف إبداعاتها الفنية والأدبية وغيرها، ما رأي شاعرنا بيهار بالحادثة وبالشعر الكردي الحديث؟

دواويني المطبوعة هي / زندان، بانك / رابرين / سرخبون / بيشكتن / أما عن الاتصالات التي لم تر النور، كتاب سننا، منذ ١٩٥٠ كان عضواً في

الحزب الشيوعي السوري، فأصبحت أحد أصدقاء الحزب والتقيت بعدة شخصيات سياسية عند أخي اسماعيل كرشيد كرد وجيكروين وغيرهم من الشخصيات الأخرى، وفي العام ١٩٦٠ عندما جاء المناضل أوصمان

صيري إلى سري كانيه لغاية تأسيس تنظيم للبارتي فيها قدم تكليفي وأخي اسماعيل لهذه المهمة بعد ان اضنم إلى البارتي. خلال هذا النضال كانت لي تجربة في السجون، أول مرة دخلت السجن عام ١٩٦٢ ومن ثم ١٩٦٦ و ١٩٧٥ و ١٩٧٠ ، لكن في الحقيقة هناك السجن الأكبر هو السجن النفسي

فعدنما لا تستطيع أن تعبر عن رأيك وتختفي الاجهزه الأمنية ومسئولي ارادتكليس هو سجن أيضاً، فأنا أعتبر نفسي خرجت من سجون صغري إلى سجن أكبر .

اما بالنسبة للحركة الكردية، فحالة الانشقاقات في الحركة الكردية هي حالة غير طبيعية ولا فائدة لكرد منها، وهي حالة ضعف والمستفيد الأكبر أداء الشعب الكردي، فهو الأوضاع ستودي في النهاية إلى ابعاد الشارع الكردي عن الحرفة، فيكوننا انشقاقات موسيقاً، ولك محطات تعدد في الشعر بالموسيقا، مما هي هذه العنوانين ومع



عن الموسيقا في الشعر، وإذا اختلف الموسيقا من الشعر تحول إلى نثر، والشاعر هو شاعر في النهاية والذي لا يمتلك القدرة على كتابة الشعر الكلاسيك فهو غير قادر على كتابة الشعر الحديث أيضاً والعكس صحيح. والذى لا يمتلك القدرة على كتابة الشعر الشعري فالحالى لا يستطيع كتابة الشعر سواء كلاسيكي كان أو حديث .



# Yekemîn Weşanxane Li Rojavayê Kurdistanê أول دار نشر في غرب كردستان

wesanen.dar@gmail.com



## صدر حديثاً

شیار عیسی  
تساؤلات فی  
الدیمقراتیة  
سوریا نموذجاً

شیار عیسی

تساؤلات فی  
الدیمقراتیة  
سوریا نموذجاً

## إصدارات سابقة



### مراكز توزيع كتب Dar

قامت مكتبة الأنوار (شارع عامودا مقابل مطعم الصمود)، مكتبة آواز (شارع عامودا)،  
مكتبة ميراف (طريق الحسكة جانب كازية لازكين عارف)، مكتبة طيور الجنة (شارع  
الكورنيش مقابل حلويات علي عمر)، ايفا للاتصالات واللوازم المدرسية (ميسلون جانب مكتب  
ب د ك - س الشرقي - دور الأعلاف)، مكتبة آلان (قناة السويس جانب جسر المشاة)  
(ديرك: مكتبة مانيسا خلف مبنى البريد). (كركي لكي: المكتبة الرئيسية). (جل آغا: مكتبة  
وائل). (تربي سبي: مكتبة الجهاد). (عامودا: مكتبة هجار (مكتبة الثقافة سابقاً)).  
(الدرباسية: مكتبة سما). (الحسكة: مشعل عثمان أبو نصرين). (سري كانيي: مكتبة هيفي)

## Diktatoriya Nû

Turkiyeye diktator an ji Turkiye ya Osmanî hînjî rastir Turkiyeye ku iro di bejnûbala Erdoganî de wan herdu taybetmendiyen navborî teşe digire.

Erdogan komara sekulerist a Faşizma Spîku bi destê Ataturkî li gorî bejnûbala Ewropî hatibû avakirin hildiweşine û dike mînakek bêhempajî diktatoriye Rojhilata Navîn.

Li ser gotina Ocalanî iro her sê "Faşîzmên Kesk-Reş-Spi" di kesayeta Erdoganî de dicivin û sentezekî nû ji diktatoriye di kaosa herêmê de serî radike ku pişt re dê wek mînakén xwe yên klasik hilweşê.

Piştî şeş mehan ji rewşa awarte; perlemantoya ku di encama darbeya 15'ê Tîrmeha borî de kete destê Erdogan, vê OHAL'ê sê mehîn din dirêj dike ku zêdetir ji diktatoriye bisepîne. Keysbaz Erdogan vê kaosa "Rojhelat" ji xwe re bikar tîne da ku qirkirineke siyasi li dijî Kurdan û demokratan pêk bîne.

Piştî darbeya dawiyê Turkiye derbasî qonaxeke nû ji diktatoriye bû û bi hezaran sîvîl, karmend û serfermendarên artêşê avetiñ zîndanan û bi se-

dan ji wan kuştin. Her wiha bi dehan rojnamevan hatin girtin û bi dehan jî dezgeh û saziyên çapenemiya Kurdi û Tirkî hatin bêdengkirin.

Demîrtashê ku ber bi pêla vê diktatoriye ketibû ji Girîghe Edirneyê nameyek şand û tê de diyar kir ku AKP civakê ber bi kaosê ve dikişine. Gelo mirov dikare gotina Demîrtashî sererast bike û bêje ku kaosê AKP ber bi xwe ve kişandîye û êdi nikare jê derkeve ji lewre bi awakî Donkîşotî ketiye çapûrastê xwe!?

Ez ê bi xwe bersiva vê pirsê bidim û bêjim: Béguman wisa ye! Turkiyeye ku sala nû bi xwînê pêşwazî kir; di heftaya destpêka salê de zêdetirî pênc êrisan hundurê Qesra Erdoganî hejandîne.

Turkiyeye ku sala borî di teoriya Ehmed Dawotoglu a "Sifir Pirşirêk" de fetisî û di encamê de hikûmeta wî ji aliye hevkare wî Erdogan ve hilweşîya, niha heman Erdogan e ku dixwaze van hilweşandinê xwe yên hundurîn sererast bike. Heri dawiyê Berdevkê Hikûmetê Nûman Kurtulmuş rabû û diyar



Şêrwan Yûsiv

kirku "Ji destpêkê ve politikayê Sûriyeyê şasî bû.. Em niha van sererast dikan!"

Yıldırım ji dixwaze hilweşandinê pêşiyê xwe yên 2016'an pirspan bike, berê xwe daye Bexdayê û disa jî li ser gotina Kurtulmuş: "Di mesela Musilê de divê bi hikûmeta Iraqê re itifaqek nû bê avakirin".

Erdoganî diktator iro xewnen xwe yên New-Osmanî li gor Itîhat Tereqiya nû AKP-MHP dirêse, lê belê di wextekê de ku

Turkiye ji Heleb û Mûsilê dûr dimîne û di nav aloziyên xwe yên hundurîn difetise; golo wê bikaribe wek pêşiyê xwe Ataturk rîli hilweşîneke giştî bigire û komareke li gorî xwe li ser lingan bîhêle?

Disa jî ez ê bi xwe bersivê bidim ku; kurd ne kurdên berê ne!

## Koda Zayende Hêviyan Pêk Nayne

Piştî agirê şoreşa Rojavayê Kurdistanê gur û geş bû û tevgerên hevgirtî ji bo dabinkirina mafû erkan di nava hemû çinê civaka xwerû de, hem di pingava rizgariyê de û hem di qunaxa avakirina sazi û dezgehê civakîde, ûlî darxistina rîveberiyek sîvîl di herêmê Rojavayê Kurdistanê de. Tişta balkêş ew bû, aktîskirina rola jinê û besdariya wê di hemû movikê rîexistinbûyin û rîveberiyê de, xwe bi berferehî da pêş û çîna jin bû xwedanê wizeyek dinamîk û veguhîr di gelek mijarê civakîde, ev e jî diyardeyek nû ye di tevahî herema me de ku jin bi girseyî tevlî xebata rîveberî, xizmetguzarî û leşkeri bibe, ev nîşana pêşkeftin û hêmîniyê di teyora pragmatî di nava kêseya Sûrî bi tevahî û rewşa kurdî bi taybet de.

Di vê derbarê de gelek biryar û zagon ji encumena zagonasaz yên bi vîn û xwesteka gel ûjinê, di çarçiva teyora aydyoloyî de derçün, nemaze di beşê besdariyajin di nava dezgeh û saziyên sîvîl, siyasî û xizmetguzarî û de hatin avakirin, û koda jin ya bi radeya 40% dabînkirî, eve jî kirayek rast e û li gor hemû pîvanên navnetewî û şaristanî guncaw e.

Lê derbaskirina vê kodê, bi ser ve zêdekîrîna deng û para saziyên girêdayî jinê bi koda


dabînkirîve, dihêle ku zayende-ya jin xwe li pêş bixîne û hejmarek berfereh ji jinêne ne pêkhatî û ne çalak di piraniya dimenan de diyar bibin, di encamê de dilgiranî û stûbarîk mezin peyde dibe û bargiranîyê tavêje ser ekonomiya rîveberiya xweser, tevî ku piştafî yan kêmxitina rola zayendeyâ nêr diyar dike, bi vê kiryarê gelek ji kesen pispor û zanyarê xwedan zanist û ezmûn ji der ve dimîn, ta radeya ku koda zayendeyâ nêr (mîr, zîlam) bîghêje 25%, eva jî di hêla prafîkê de ne rewa ye, û bê encamên erêni dimîne, ji hêlekî ve ev kiryar mandobûnê yan nîfretek dijberî peyda dike, û nestê nîzimbûnê diafîrîne, yan weki tolekî li hember mîran tê naskirin.

Mijara herî balkêş di qunaxa vê şoreşê de, ji hevketina hînek nîrxên civakî ye, bi taybet di hindurî malbatê de, ango jîna ne tîghiştî pozê xwe li zîlamê xwe yan li birayê xwe bîlind dike û tevlîhevîyê di rewîşten kurdewerîyê de diçîne, gelek caran ev helwest gihaye radeya ne lihevkirina jin û mîran di eynê malbatê de, ta lütka herî li jor di nakokiyê de û bûye sedem di avakirina hînek bend û girêbest di navbera wan de, heger em nebêjin ku di gelek bûyeran de xwe gîhandîye radeya belavbûna malbatê bi giştî û jin û mîr ji hev cihê bûne,



Melevan Resûl

dêmekî em dikarin bêjin ku yasayê wisa hestiyar û kirîstîk bihişmendiyek civakî heye, yan wêbibe sedemê afat û karesetên ne rewa, bila tu carî em jîbir nekin ku gelek babet û mijar hene, ew gelek hestiyar in, tu carî yasa û zagon nikarin wan nexweşîyên civakî ji hal hilîne, berevajî wê yekê, wê gengeşeyâ di navbera malbatê de gur û geşir bibe û li şuna em malbatê rizgar û ava bikin, wê malbatata me birûxe û ji gelek nîrxên xwe yên pîroz dakeve, nemaze sebareti sistema rîveberiyê, xweristbûn û civaka xweza ji xwe re bingeh dibîne, li ser wî hîmî em dikarin civaka xwe li pêş bîxîn û zagonen xwe sererast bikin û bi pêş ve bidin. Pabendiya bi pîvanen zanyarî û piratîkî, hevrîzyek rast û bi bingeh datîne, her weha koda ji layê hevpeymana civakî ve, ya mîna zagon û yasaya welate, ji bo rîexistina civakî rîveberiya welat misoger dike.



Fêrgîn Melîk

tevahî ji bawerîyen berê û Yarsanî dûr ketine, di rengekî têkliheviya sûmî, Şî'i, bawerîria kevn, Yarsanî û nîjadperestî Tirk de bûnîn xwedîyê tîghiştîneke sosret û di nava vê geremolê de tevdigerin. Di pîraniya komeleyen wan de ne tenê wenevê Eli (wêne sembolik e) yê Hacim Bektaş (evjîsembolik e.) û yê Mustafa Kemal ê ku bi deh hezaran elewi bi komkuji kuştî têr darvekirin. Li Kolnê ew bangê; "al û sembolan daynin, bila yê federasyonê werin pêş, yên din li paş bîmîn û nîzanim ci û çi!".

Tev de encama vê tîghiştîna vê tevliheviya wan, dagirker û çepgirêne tirk yê salen hefteyîne ku di mîjîyên wan de hatine çandin. Mirov dikane wek prototipeke CHP'ê ji bi nav bike. Hetanî şoreş li dij her rengê kemalîzmî bisernekeve, dê e rastiya wan jî neguhere.

Yarsanîyên Kurd:

Yarsanî; yarê insan (bi zimanê hînekan Elewiyên kurd) Em yarsanîyên kurd ne Şî'a, ne Şî'i, ne jî Elewi (afîrîndekîa tirk) ne, em YARSANÎ ne. Bingehê me ta diçe digihîje bawerîya Mithra û destana Gilgamîş. Cihana me û cihana afrîdekîn tirk, faris û ereban ji hev cuda ne. Di navenda bawerîya me de mirov heye. Em dibêjîn; „ramanen pak, axaftinê pak û karên pak“ Em cudahînakîn navbera mirov û bawerîyan. Ji nîjadperestî û zayendperestî nefret dîkin.

## Li Ser Dengê Bilind ê Rûsyayê Tirkiyê Tev Digere



pêşeroj cewherî

lêborîna xwe ji Mosko bixwaze û soz bide ku careka din tiştekî din wilô neke û buhayê balefirê û xwîna balefirvan ji bide l.

Dibe ku Rûsyâ di rojên bê de pêngavan tolhîdanê li dijî Enqera pêk bîne weke zêdakirina bombebaranê li Rojavayê Sûryê bike bi armanca tunekirina komên çekdar yê ku destekê ji Tirkiyê destîne bike. Xuyaye Potin wê çekdarên navbûrî ji Sûryê derxîne û ev jî tê wateya dirxestina siyasta Enqera ji Sûryê .dibe ku ev yêk bêtir pêla pena-beran ber bi Tirkiyê ve zêde bike. Ü hejmare wan iro li Tirkiyê 2,2 milyone û piştigiriya PKK li dijî Tirkiyê bike. Herweha piştigiriya PYD ku şaxekî PKK li Sûryê tê naskirin bike, ya ku dixwaze Carablû û Ezazê bistîne û herdû deveren Koban-Efrîn bigihîne hev. Alikariyek Rûsyâ ji bo PYD bi vî awayî hemî Başûrê Tirkiyê dikeve bin bandora PPK ê. Ev alozî kûrtir dibe ku, Tirkiyê ji ber tekevan li dijî Rûsyayê bide.

Li ser hêviya Nato û Amerîka bi xwe re derbasî vê alozîye li dijî Rûsyâ bike yan jî destekê bide hemî çekdarên ji Asya navin Şîsan û Qoqazî ku wan li dijî Rûsyayê li ser xaka Sûryê bikar bîne bi vê siyastê dibe ku Erdogan û karbîdesten Tirk destakê ji nîjadperest û islamîstên Tirkiyê bistîne. Di vê derbarî de û li ser Asta her du rîbazaan siyasta Tirkiyê li ser duriyanek siyasi rîwestîyave. Li ser dengê bilind ê Rûsyayê Tirkiyê tevdigere, û tevgera wê iro em dibînîn zor hatiye guhertin, lê heta ci radeyê ye, hê tam û stratejik ne zelal e.

Peymangeha washington a lêkolînê stratejik

## Nivîskar û Şêwekarê Kurd Amir Ferso Ji Bûyerpress Re: Rêjîmên Dîktator Tenê Nivîskarê Kole Dixwazin, Ku Li Wan Miqate Bin.

- Rêjîma Sûriyê du caran weşandina pirtûka min

"Helbestvan û Qamçîbaz" qedexe kir.

- Qelsbûna rewşa çand û hunerê di R.K. di sê xalan de tê: Abûrî, civakî û ya herî bi bandor siyî ye.

- Niha min 23 tablo ji dîroka "Hûrî û Mîtanî" hilbijartine û ji bo avahiyeye girêdayî partîya PYD, amade kirine.

**Amir Ferso di sala"**

1975 an de li bajarê Amûdê - Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye , û ew hîn li bajarê . Amûdê dijî

Di warê çand û hunerê de xwedî têkîlî ye, şano û kurtirîn çîrokê dînîvisîne, û di hin roj-name û kovaran de diweşîne, li hêleke din jî hunera şêwekarîye bi taybetmendîyeke kesayetî û herwiha bi şewazekî teknîka tay- "bet bikar tîne

- Ji beşê nivîsandinê em destpê bikin, we kengî û cîma berê xwe da nivîsandinê çîrok û şanoyê?

Min di salê 90î de hewildanê nivîsandinê kirin, lê ji ber sedemê, abûrî, siyâsi, û temenê biçük, min ew berhemê xwe yên asan paşguh kirin, lê min

- Hûn ci mijaran ji çîrok û şanoyê xwe re hildibjîrin, gelo afrandinin, yan jî hûn hin sîdê ji dastan û serpêhatiyê mîletê Kurd dîkin?

Di beşê şanoyê de ez bêtir şanoya siyâsi û civakî dînîvisim, lê di beşê çîrokê de, ez ramanê çîrokê xwe ji hemû besen jiyanê hildibjîrim bi şewazekî nuh nûvejin dikim û hewl didim ku jiyanê ji nû ve di dîmenê mirî de bafrînim.

- Em hînekî li ser nivîsandinê we di warê "Şanoya Siyasi" de baxîvin, cîma ev şêwe? û gelo ezmûneyê vê şêweya nivîsandinê di nav Kurdan de hene?

Ji ber ku êş û derdêni vî mîletî girêdayî ne bi sedemê siyâsi ve, ez li ser têgehê desthilatdari, setemkarî, azadi û dadmendî şanoya xwe dihonom.

Bi giştî hindik kes şano dînîvisin û şanoya siyâsi bi taybetî nivîskarê wê kêm in.

Ew berbaziya kurtirîn çîrok li Misrê ya bi navê ( Diwan Ele-reb ) bû. Ez besdari vê berbaziye bûm bi pirtûka xwe ya bi navê " Razê Mayine ". Min pileya yekemîn qezenc kir.

- Li ser weşana vê pirtûka te, xwesteka ewlekariya rîjîma Sûriyê ci bû, ku ew-qas astengî ji we re çekirin? Ku hûn li ser pirtûka şano ya " Helbestvan û Qamçîbaz " daxivin, du caran weşandina wê qedexe kirin û erêniya çapkirin nedan, ji ber ku mijaren wê siyâsi bûn û ne li gorî hişmendî û daxwazîye rîcîmî ji nivîskaran, ji ber ku rîcîm tenê nivîskarê kole dixwaze û miqateyê lê dike.

- Xwendina we ji rew- şâ çand û nivîsandinê di Rojavayê Kurdistan de ci ye?

Mixabin rewşa çand û hunerê li Rojavayê Kurdistanê di asteke nîzim de ye, û sedemê vê rewşê pir in di sê xalan de cûda dibin, ya yekem aborî, ya du-yem civakî û ya herî bi bandor ya siyâsi ye.

- Di nav nakokîyan û gelek çarçoveyê nivîskaran de Amir Ferso li kû derê ye?

Amir Ferso ji bo ku xweşikbûn û hezkirinê di cihanê de pir bike kar dike. Û ji ber vê yekê ew hemû nakokîyan-ku hebin - paşguh dike. Tenê ew kar dike ji bo ku nameya xwe ya mirovahî berdewam bike.

Di vê demê de ez pirtûk, belge û hemû jêderên girêdayî bi "Keleha Dimdimê" kom dikim, ji bo ez naveroka vê efsaneyê bi rastiya nêziktirîn ji mentiqê mirovê Kurd re, wek tablo ji bo civaka Kurdî bi taybetî û gelê cihanê û evîndarê hunerê bi giştî pêşkêş bikim.

- Ji bili herêma Kurdistanê hûn besdari hin pêşengean bûne?

Wek me da nasîn pêşangeheke kesayetî li Subartu - û çend komepêşangehan bûm, wek

- Em berê xwe bidin nave-roka pirtûka te" Helbestvan û Qamçîbaz "?

Pirtûk ji sê şanoya pêk tê. Ew di şanoya "Sultan" bi bêtirsî nêzi serê qûçê desthilatdariye dibe wî rexne û şirove dike. Di şanoya bi navê " Eynikê Cinîral " de, Ew raweya ketina derûni ji wî cînîralê setemkar re berçav dike di dema helwişandina rîcîmê. Di şanoya " Helbestvan û Qamçîbaz " Ew kar dike ku bêje; yê di zindanê de her dem ew qamçîbaz e, ne mirovê azad û rewsenbire re ji bo vê sedemê name û armanca helbestvan dibe ku ew qamçîbazê xwe Azad bike.


- Li gor me nivîskar Amir Ferso şopandiye, hûn besdari berbaziya nivîsandina kurtirîn çîrok bûne, li ku bû, û we ci ji wê besdariye qezenc kir?

navê wê pirojeyê "Dîroka Hûrî û Mîtanî" ye, em li ser vê pirojeyê ji baxivin?

Nuha min 23 tablo ji dîroka "Hûrî û Mîtanî" hilbijartine û ji bo avahiyeye girêdayê ( Partiya Yekîtiya Dîmoqrat ) min ew amade kirine, û di demeke nêzik de wê berçav bibin.

- Di bijartina navan ji bo pirojeyen we yê şêwekarîye hûn tenê nav dihilbijîrin yan, navaroka tabloyan ji xwendina we ya ji dîrokê re té?

Jêdera mijar û navê pirojeyen min ji xwendina min ya ji



dîroka Kurdî re té.

- Di vê derfetê de me dix-west hûn hînekî li ser pirojeyâ we " Kelha Dimdimê " ya ku hûn xwe jê re amade dîkin Baxivin?

Nameya min bi giştî ew e ; ku ez xweşikbûn di çavêni mirovan de vejînim û rewanê azadiye di mirovan de biçînim.

- Xwena te ya ku tu dixwazî li ser kar bikî ci ye, û ji bo bikaranîna wê ci giring û pêwîst e?

Xewnê nivîskar û şêwekaran nayen jmîrtin, lê ez dikarim bîbêjîm xewna min ku sê êş li ser riwê gerdûnê nemînî ew setemkarî, xizanî û nesaxî ye.

- Şîret û qewîtiya te ji nîşê



**Hevpeyvin: Qadir Egîd**



nû re, ku dixwazin berê xwe bidin şêwekarîye û nivîsandinê?

Ez ji wan re dibêjîm: Ji bo nivîsandinê pêşî pir bixwînîn û bi canekî azad rahêjin pênuşa xwe û binivîsin, di şêwekarîye de ji wan re dibêjîm ji surîşt, mirov û dîrokê hez bikin û rahêjin rengê xwe li ser aşîmanê tabloyê xweşkbûna xwe şanî me bikin.

Gotina dawî? Gotina dawî ..... Ez tu carî li ser xwe nabêjîm ez nivîskar yan ji şêwekar im ku ez nameya xwe neghînim mirovahîye, û di dawiya gotinê ez spasiya Rojnameya Bûyerpress ya birêz dikim, û demen xweş ji we û xwendevana re.

Berhemê destnîvis:

- Razê mayînê - kurtirîn çîrok bi zimanê Erebî ( سر البقاء و )
- Xulek bêdengî - kurtirîn çîrok bi zimanê Erebî ( دقة صمت )
- Goristan û Kîlor - şano bi zimanê Erebî ( المقرفة و )
- Nameyên Demjîmîra Dawî - şano bi zimanê Erebî ( رسائل الساعة الأخيرة )
- Gurzeke Stiriyan - sînaryo bi zimanê Kurdî.

**Wênekêş: Birîndar Ebdo**



dev ji nivîsandinê berneda, lewma di despêka sala 2000an de min pirtûka xwe ya bi navê " Helbestvan û Qamçîbaz " amade kir ji çapkirin re lê mixabin ew nehat çapkirin ta sala 2010. Ji hemû besen wêjeyê min şano û kurtirîn çîrok hilbijart ji ber ku şanoyê karîbû bi sîngeke fireh hemû raman û nameyên min himbêz kiribe û giyan diba xwendevan.

Ji hêleke di ve hemû nivîskaran berê xwe dane helbestê û dûrî besen din yên wêjeyê çûne û ev xal pêwîstiya wê bi lêkolînê heye .

- Çîma nivîsandin bi zimanê Erebî û ne yê bi Kurdî?

Ji ber ku ez bêtir bi zimanê Erebî jêhatî me. û ji bo zanînê ez bi kurdi jî dînîvisim. Lî mi-xabin kêmîtir ji zimanê Erebî .

- Em berê xwe bidin nave-roka pirtûka te" Helbestvan û Qamçîbaz "?

Pirtûk ji sê şanoya pêk tê. Ew di şanoya "Sultan" bi bêtirsî nêzi serê qûçê desthilatdariye dibe wî rexne û şirove dike. Di şanoya bi navê " Eynikê Cinîral " de, Ew raweya ketina derûni ji wî cînîralê setemkar re berçav dike di dema helwişandina rîcîmê. Di şanoya " Helbestvan û Qamçîbaz " Ew kar dike ku bêje; yê di zindanê de her dem ew qamçîbaz e, ne mirovê azad û rewsenbire re ji bo vê sedemê name û armanca helbestvan dibe ku ew qamçîbazê xwe Azad bike.

- Li gor me nivîskar Amir Ferso şopandiye, hûn besdari berbaziya nivîsandina kurtirîn çîrok bûne, li ku bû, û we ci ji wê besdariye qezenc kir?

## Jina Kurd Di Navbera Civak, Ol û Yasa de

helbestvanê héja Seydayê Cegerxwîn dibêjê: Girêdayî heta kengî bimînî bi dîl û wenda bî Dixwazim ku wekî mîr bî bi dijmin re tu dijmin bî Di cengê de wekî cin bî ne rengê bûm û kunda bî Wisa Cegerxwîn rewşa jina kurd dixwest, belê iroj rewşa jinê ci ye.. Pirolblêmê wê ci ne?

Helbet em nikarin li ser hemî piroblêman biaxîvin belê bi taybet jina karkir, çalakvan, nivîskar û astengiyêñ ku dibîne nérîna civakê û yasa ji jinê re bi tevâyî çawa ye?

Ü li dawî çawa jin dikare erk û mafen xwe cîbeci bîne?

- Helbet jin pir zehmetiyê dikşîne dema ku li hundur û dervî mala xwe kar dike, belê jina kurd ji demen dûr ve dikaribû bi awayekî çak û bi hêza vîna xwe bi rola xwe rabe di bergeha çandî, mafnasî, wêjeyî, abûrî, û politîk î

Nexasim dema cemhûriya Mehabad li dar ket, û dema ala ya kurdi li ser xaka wî bajarê pîroz bilind dibû, jina kurd di rîza pêşî de besdari wê li darxistinê bû jiber roleke wêyî pir mezin di avakirma wê simbola yekem ji kurda re hebû.

Civak û Ol  
Pêwîste ku em bêjin tevî dijayedîya mîr, ol û civakê bi

sedên sala ji fîrbûna jinê re, belê destin sipî dikaribûn alîkar bin di vê bergehê de, wek nimûnakê Mella Ehmedê Namî, dema ku di Qamişlo de tenê dibistanek ji bo keçikan hebû Mella li gundê Tilse;îrê dibistana duwemîn ava kir û gelek jinê kurd fîr bûn û gihiştin fîrnameyêñ bilind yasa

- Nijad/Elcinsiye/ji bili ku gelek jinê kurd ji njada xwe bê par man, wisa jina kurd weke jinek Sûrî nikare di yasa Sûrî de njada xwe bide zarokêñ xwe, mixabin ev yasa dijî raghandina SIDAOW hattîye .

- Piraniya jinan "تعدد الزوجات" yasaya Tirkî ji sala 1923an de piraniya jinan qedexe kir, belê ev qedexekirin di yasaya Sûrî de ji sala 1973an de seranser hat, dema ku súcek rewayî hebe ew qedexekirin tunne dibe, ev ji pêv kîrin bû gişî û hîn mîr di vê babetê de azad e.

- Paşmay "El- mîras" .. Yasaya Sûrî bê guman nérîna rewayî teqez dike ku pehra mîr du cara li pehra jinê ye ji bili erden ku bi tayebet ji bo çandînyê ne tenê ew hîn di bin bandora yasa ya ferensî de ne .

- Govayî "El-şehade" .. Govayîbona mîr ew jî bi gişî wek nérîna ol li himber du govayîbûna jinê ye.



Parêzer: Şehnaz Şehnaz

- Berdan..Dayîngeh "Elheda-ne"

Dema ku zarok digihêje temenê sêzdehan û pazdehan di yasaya Sûrî de "bav dayikê ji dayingeha wan bê parî dike. Berdana bê sûc "الطلاق التقسيمي" : di berdanê de bigîşî mafê jinê ku bi cî û war be û mafê wê ku jiyanek bi rûmet bijî, ev mafen ku ragihandina mafen mirovan misoger dike, yasaya Sûrî neparastin .

Belê bi rastî mersûmê jinê yê ku Desteya Jinê di Rojavaya Kurdistanê de di sala 2014an de ragihand û tev kîmaniyê wî belê gelek mafen jinê wek yasa di wî mersûmî de hatin parastin nexasim wekheviya wê bi mîr re .

çareserkirina van piroblêman .

- Destûrek bajarî /medenî/

- Sazgehêñ civaka sivil ku bi rola xwe rabin li himberî fîrbûn û azadkirina jinê de

- Medya û rola wê di belavkirina agahiyêñ mafen jinê û wekheviya wê bi mîr .

- Avakirina têkeliyan bi jina Rojhilata Navîn û hemî jinê cîhanê re.



Bêrîtan Sarya

di rîyêñ cuda re hatine û li vir hev dîtine."

Xalê zarokan Emîn bi vî rengî dibêje ku wî tê derxistîye zarok xwarziyêñ wî ne: "Raîd dema hat kampê gotibû ew ji Siba Şêx e. Ez jî çûm cem wan. Min hêdî hêdî jê pîrsî. Digot navê dayika wî Adde, navê bavê wî Reşo ye. Her wiha got, birayekî jê mezintir Erkem û dayika wî li Reqayê ne, lê haya wî jî yê din nîne. Wekî din haya wî qet ji bavê wî tinebû. Piş re min baş zanî ku ew xwarziyê min e."

Ji bo zaroka din a hatî kampê jî Emîn dibêje, "Min zaroka keç qet nas nekir. Lî wê jî gotibû ew ji Siba Şêx e. Zarokan hev nas nekir, lê timî li hev dinîhîrîn û dikenîyan. Haya keçikê qet ji malbata xwe tinebû. Bi tenê navê gund, dâyik û bavê wê dihat bîra wê. Wê demê derket holê ku her du zarok xwiş û birayê hev in, xwarziyêñ min in. Ew jî ji me hîn bûn ku xwiş û birayê hev in."

Xalê zarokan Emîn got, ev yek ji bo xelkê li kampê jî bû hêviyek ku bigîşejin xizmîn xwe.

## Çiroka Du Zarokêñ Şengalî

kişandin.

Yek ji gundûn derba herî mezin di fermanê de xwar, Siba Şêx Xidir e. Topêñ hawanê yêñ DAIŞ'ê li mala wan dikevin û tevî dayika wan birayê wan Ekrem jî birîndar dike. Dûr e çeteyêñ DAIŞ dikevin nava gund û gelek mirovan qetil dikîni. Yek ji van malbatan jî malbata Cûmana û Raîd e. Cûmana dema dîl tê girtin, yek ji pênc xwiş û birayê wê Raîd jî hê 4 sali ye.

Xalê Cûmana û Raîd ê li kampa Newrozê, Emîn wê şevê dema êris dike li gundekî din ê li Şengalê ye û ji xwişka re dibêje, ber bi aliye wan ve bê. Lî belê ji ber ku ew û xwarzîyekî wî birîndar in. Xalê herdu zarokan Emîn, berê bi rîya telefonê bi xwişka xwe re dipeyive, û wisa dizane ku herî dawî li Tilafere ye.

Her du zarokan ji zimanê xwe ji bîr kiriye û bi tenê bi Erebî dipeyivin. Raîd dibêje, ew ji Siba Şêx Xidir e û heta niha li Reqayê bûye. Ew ji Reqayê direve û tê heta cihekî. Li wir jî şervanê YPG'ê wî dibînin û wî tînîn kampê. Derdikeve holê ku wî û Cûmana li Reqayê qet hev nedîtiye. Ebû Ziyad ji bo reva wan dibêje; "Me ev ji wan fêm kir, dema reviyan haya wan ji hev tinebû,

## Koçberiyek Ber Bi Sîrgungehê Ve

Xewn biçük in, hêvî mezin in, û di navbera wan de eş e. welatê xwe li ser pişta xwe dikim, û hîn dilê min bi dengê welat, dengê zengîlen nîvê şevê, û riwê biyan ku di nîvê kolanan de, di nav xircirê de, dinalin, lê dide. Hemûbi tirs in, û ditirsin, tu tiş tune ye ku desmalka tires û tarîtiyê ji wan dûr bixe. Bi tirs in û bê rawestan bi rî ve diçin, lê bi ku ve, ew jî nizanin.

Careke dinigrin, li paş xwe meyze dikin, qîrîn û hawarek ji paş wan tê, jin û zarokin dikin hawar û qîrîn, lê ew guhê xwe dignin ta ku dengê xircira ramanen balavbûyî neyê wan, dinalin û dikin qîrîn, û dûv re dili-kumin û dikevin, li azmanen bilind meyze dikin, ew jî mîna her tiştişî reş bûye.

Careke din diramin, bi xwe û xwe re diramin, em li ku wenda bûn, xewnê me li ku wenda bûn, gelo li paş me mane? Gelo em li ser êşa xwe dignin, yan gelo divê em êşeke din hilgrin, berê

gotine mirov tenê dikare êşa giran hilgire. Lî em ne mirov in, em nema mirov in,

biramin, gelo ci hişt ku ew bigîşejin vê deverê, xewnen wan bi ku ve çûn, herweha dilen wan jî, desten xwe li dilî xwe dipelînin, ta ku nas bikin ku hîn di cihê xwe de ye, lê mixabin cih vala ye, bi ku ve çû, ew jî nizanin.

Careke dinigrin, li paş xwe meyze dikin, qîrîn û hawarek ji paş wan tê, jin û zarokin dikin hawar û qîrîn, lê ew guhê xwe dignin ta ku dengê xircira ramanen balavbûyî neyê wan, dinalin û dikin qîrîn, û dûv re dili-kumin û dikevin, li azmanen bilind meyze dikin, ew jî mîna her tiştişî reş bûye.

Ew jî bi hemû êşa xwe li hêviya vê kîlikê ne, kîlikâku wê ji hemû êş û azaren xwerigar bibin, êşen bêdawî.

Bi rî ve diçin, û giyanen wan ber bi sîrgungehê ve koç dike, sîrgungeha dawî....!



Fatma Hesen

em bûne leylen. Vaye careke dinigrin, û azman jî bi wan re dignin, radiwestin û berdewam dikin, lê bi ku ve.. bi ku ve, ber bi werîsê darvekirinê ve, ma ci jîbilî werîsê darvekirinê li hgêviya wan heye! Ew jî bi hemû êşa xwe li hêviya vê kîlikê ne, kîlikâku wê ji hemû êş û azaren xwerigar bibin, êşen bêdawî. Bi rî ve diçin, û giyanen wan ber bi sîrgungehê ve koç dike, sîrgungeha dawî....!

## Mirov Kevin e.. Kevinahiya Damar û Rehêñ Xwe

Mirov çiqasî bi temen mezin dibe, û ber bi qonaxen dawî ji jiyana xwe ve diçe, wiqasî ji laş û tenduristiya wî lawaz dibin, û nexweşî bi rengê xwe yên pirr ya xwe tê de dibînîn, û car bi car êdî ci sivik, ci giran nexweş dikeve

Bi temen re damarên xwînê nermahîya xwe winda dikin, ku êdî wek berê nema dikarin xwe fireh bikin û ku ev firehbûn bi hêsanî bibe, û hin bi hin ev damar û reh tengtir dibin

Ji xwe windakirina damarên xwînê ji nermahîya xwe re nîşana yekemînî sereke ye ji destpêka nexweşike dilînî giran re û ya ku bi navê (Arteriosklerose) li tevahîya cîhanê tê naskirin. û ji xwe heçê nexweşiya şekir(Diabettes mellitus-navê wêni latîni) an ji heweta xwînênil bilind pê re be, an ji çıxara gelekî û ji zû ve vedixwe û kemasî û pirrbûna dohn û guhertînê wê di laş de ne her dem li ser xwe bin û ne rawestandî bin, metirsiyeke mezinî din bi xwe re radijeyê û li nexweşiya xwe zêde dike

Lî Çawa Merov Bi ? Nexweşiyê Derdixe

Berî her tiştişî û pêsiya pêsi divê leza pêlén lêxistina dil di damaran de pîvana bibe û bi pîvana van pêlan re merov dikare bi ser nexweşiyê ve vebe û nas bike, û li dijî wê êdî tiştekî

. bike

Ji xwe her çiqasî leza pêlén lêxistina dil xurt be û rejeya pêlan bilind bin, wiqasî ji merov re tê xuyanîkirin, ku damarên xwînê nermahîya xwe hin bi hin winda dikin û li vir destpêka (Arteriosklerose) piştarst dike

Arteriosklerose) nex-

weşîyeke ji nexweşiyê damarên mezîn re ye di laş de û ji kombûna dohn di xwînê de, û ji girêkên di reh û damaran de, û ji gitina hîn rehîn dilî biçük de tê, yên ku dil ji hêmanen giring wekû (oksocen O2" û xwarinê nahêle, û bi sala bikeve ji ji xwe nexweş ji ber xwe ve nayê naskirin, ne ku ji nişkêve dilê nexweş reweste, dilgirêkê lêxe an ji mejî lêxe

Ü ji xwe her dem nîşanen yekem li ser vê nexweşiyê ev in, û yênu ku pirrê xelkê bi súcê wan dimrin, êdî ji ber vê yekê ez her dem dibêjim ku pîvana heweta xwînê her çend caran di heftiyê de li malê û bi taybet li cem yê ku gelekî dohn dixun û gelekî çıxara û meyê vedixun gelekî girin e, û ji xwe ya herî baş ew e, ku her çend şes mehan, pêlén lêxistina dil û leza wan li nexweşanê an ji li cem bijîşkekî dil bêne pîvana, ji ber ku her çiqasî zû nexweşî bê naskirin, wiqasî . baştir e

Derman Di Dest Me De Ye

Heger nexweşî dereng hate naskirin û dilgirêkê dudo berî anîha hebin, çareserî ji xwe dimîne ewe ku di riya operatisyonekê re rehîn dil û damarên xwînêni girtî (û bi taybet yê bi dil ve û derdora dil ve, ji ber ku yênen tîn girtin tim ew in) bêne . vekirin

Operatisona bi navê katêtera dil operatisoneke hîsane û iro roj ji hezarê . xelkê re tê çekirin

Dermanê di dest me de ji xwe ne ev bû, dermanê me, xwarina tenduristiye û pilana wê li gor laş e, û werziş e, ji ber ku çiqasî mirov li ser xwe bigere û tevgera wî hebe, wiqasî ji rehîn dil û reh û damarên laş bi tevahî xwe bi xwe fireh dike û nerm dimîn, û bi temen re ji li ser xurtbûna vê nermahîye dihêlin , û xwarina kêm dohn jî li vir rolekê gelekî mezin û giring dilîze



Alan Pîrê

## Helbestin Bijartî .. Anahîta Sîno

**Anahîta Sîno**  
**hevsroka Yekîtiya**  
**Rewşenbîran şaxê Serêkaniyê.** Di sala 1972an de li bajarê Serêkaniyê li Rojavayê Kurdisttan jidayik bûye, di sala 1988an de dest bi nivîsandinê kiriye . destpêka wê bi zimanê Erebî bû lê hêdî....hêdî bi zimanê kurdî nivîsand li kêleka zimanê Erebî.

### Heyva kêt û xeman

Ey avdara min ey avdara rengin...çend komkujî hîn di malzaroja tede ji kurda re veshartiyi  
 Çend dijmin rengê xwe ji gesbûna te diziye.Ev faşista keske...ev faşista sore ....ev faşista Reşe...Ev bi riye ...ev bê riye.. Ev rîcime ev nizanîm kiye

Ezê kê bînim bibîr û kê jibîr bikim Avdara min Zarokên xerdela sêvan an xorîn (2004)...an newroza Hisiçan Ma ci qederk reş xwe li bejna te pêçaye û xêliyik ji xeman bi ser tede berdaye..

Lê xemgîn nebe Avdara min erê Ez caran ji te bîhers dibim...erê caran dijmîrim ku çend birîn di hinavê tede di bedena Kurdistanê de dijmin çandiye ..lê Ez dizanim ji ku Kawa agirê serkeftinê li ser bejna setemê vêxistiye û tovîn azadiyê di sîngâ te çandiye û bi xwînê tête avdan Belê Avdara min xemgîn nebe

Ew kulîlkîn li ser serê te Ew kembera li pişta te Ew kenê li ser lêvîn te....berhemîn  
 Ü bi hezarn komkujî nikarin kulîlkîjî kirasête biçlmisinin Xwe bi hezar rengî bikin ew yeke û nikare newrozîn Mezlûman agirê Zerdeşê kal vemîne  
 Şehîdîn Hesekê wê bibin al ..bajarek ji hestan ...wê...bibin çîrok....bibin dastan....bibin dirok û bimînin.....her bimînin

### Nameyek

Nama te di dilê min de Hêlinek ji xwere çêkir Çivcîva peyvîn te têde Dilê min fîrî fîrî kir .....

Bi hêviyan yan bi xewnan Te ev nameya nivîsand Yan bi tîrêjîn dilê xwe Hestê xwe te têd neqîsand .....

Çawa bersva te bidim Raman û dil te tev revand Mezin bûna komê pirsan Min li dû bersva gerand .....

Ezê di quntara dil de

Bersiva te binîvşînim  
 Di nav pelên şevêne xwede  
 Ezê namate hilînim

### Nameya ewran

Ezê van ewrêne vê şevê Bi evînê bixemîlin im Tije piste pistan bikim Berve mala we bişîn im \*\*\*  
 Pir silava pêr bi rîkim Nameyek û xewnenê tazî Nav û nîşan li ser deynim Gelek hêvî û daxwazî \*\*\*

Tek -tek li pencera texe Xew ji çavan bifirine Hinavê namê ji tere Dilop dilop bibarîne \*\*\*  
 Bi destê xewnenê te bigre Dilanekê bigerîne Lîlansina herdû dilan Di sîngâ şevêd biçîne

### Evîna te

Di berbanga temenê min de Dikê evîna te bankir Cavê pîrsan li min vekir Û dilê min Ji mengê xist

### Ken

Carekê min bêriya dengê kenê xwekir  
 Ü dema ez keniyam Tilikan ji hevre gotin Vaya dîne

### Bese

Heya kengî tê kapeka ramanê xwe be  
 Heya kengî tê bi pirêzê mengê re bê şewtandin  
 Dîsa bese  
 Dengê xwe li ber bê xe Ramanê xwe vêxe  
 Ü bila bêjin dînek li me zêdebû

### Şev

Şev perçê perçê bû  
 Perçak ji evîndara re ma  
 Perçak ji dizekan re ma  
 Perçak ji miriyam re ma  
 Üyên din li benda sibê man

### DAYIK

Çendî birîn li dil ketin Bî hêşiran te pînekur  
 Çendî şevêne tîrs û tarî  
 Bî kenê xwe te imzekir

Dî mal zaroka xewnenê tede  
 Çendî hêvî ji berte çûn  
 Hîmbêz dîkî êş û gîrî  
 Tim bê dengî dirîşme bû

Bî hêviya hatna xewê  
 Çendî caran bendewar bû  
 Lî ber çira demen bê ol  
 Her kîlikêk gîran barbû

Lî ser tevna şevêne dirêj  
 Her dirêse xewn û xeyal  
 Bî evînê dîlorîne  
 Dergûşa zaroka delal

Çendî caran nîvê çevê  
 Destete li erdê ketî  
 Dis radibû çav mîzdi  
 Sev dîbîrî nîv raketî

Ne şev tenê temen pêde  
 Çav ji tere her bekçî bû  
 Lî hêviya mezîn bûnê  
 Dil û mejî tim birçî bû

Dilê reben li taxêne te  
 Her aşiq û qereçî bû  
 Qet tîrîebû ji dîtna te  
 Tim parsek û xwazgîncî bû

Eve dilen dayîkên me  
 Welatekî bê sînore  
 Evînekî ser bî xweye  
 Ew evîna herî jore

**Di wê demê de wê û hînek hevalên xwe wek Dîlan Şeqqî, Teymûr Evdîkê, Mizgîn Tahir, Hasan Eyo .... Û hînek hevalên din komelek wêjeyî ava kir bi navê "Ronak" pişt re bû "Rewangê" di vê komelê de gelek çalakiyên wêjeyî yek ji wan weşandina kovarekê bi navê "Babîsok" di sala 1994an de derxistin lê mixabin piştî sê hejmaran hate seknan-din û pişt re komel ji sekîni.**

### DIYARI

- Ji bo dayika min, ya ku evin bi şirê xwe i min mejand ,
- Ji sivanê evina zelat re (Nemir), yê ku kîrîcî ilestan, di mîrga dîl de çerand .
- Ji bo goga minî zérin ((LÎZAN)).

Anahîta 2002

**NAME**  
 Sîbeh zûbû....li ber bayê hênik...di bin namûsiya spî .... zarok çavêne xwe li xewnenî gulgulî digerînin  
 Li dû pînpînîkan direvin  
 Mezin derdîn xwe pêçane û dane ber serê xwe û bî serkeftina kobanê ser xweş bûne .... her yek di xewna xwede mîre  
 Jî nişkave !!!xewnenî gulgulî bûn serî ,pînpînîk bûn dêw ..namûsiya sîpî sor bû

Dengê serkeftinê bû gazi ..bû qêrîn ,zarok qetqetî bûn ...xwîn li kolanan herikî mirov pêl meytêne mirovan dîkin ....ji ber qederek reş direvin

Dîrevin ku....? nîzanîn ....tenê bîla dengê [elâh û ekber] neyê  
 Mejî cemidî ....hest bê hest ma ...ziman bê wate ma .

Çi ziman dikare qêrîna zaro-kan li ber tûjbûna kîrê şirove-bike ...şikestina dîlen dayikan zelal bike  
 Ka ezê ji kê bipîrsim li gor kîfa kê ev diçê,hêviyên me wekî zarokê me perçê perçê

dîbe  
 Serokno....partîno... encuma-no kî berpîrsyare?Ez....Tu... Ew... ka ez kîme ...tu kîye ...ew kîye?

Ka em wan komî ser hev bîkîn,wê bîbe Emmmmm üem di derya şermê de fetisîne...di ezeziya

zingarî de zincîr bûne bî qeyd û merbend bûne

De ka em bîhnekê vegezin xewnen xwe -----dema me çavêne xwe digit û ji xwer digot Gelo wê rojek were ku ramanen me kirasen kurdî li bejna xwe berde û hesten xwe bî rengê xwe eşkere bîkîn  
 gelo wê rojek were em rengê evîna xwe ....bihara xwe ..kesk û sor û zer bîkîn  
 Gelo ...gelo em dizanîn ku ev roj hat û welatek bî xwîna çav reşan ava dîbe  
 Belê ew roj hat .....welat hat .....lê ka em li kurin .....ka em li kurin.

### Caran

Caran te dibînim gulek  
 Jiyana min dixemline  
 Caran te dibînim dînek  
 Hêviyên min bi cî tîne \*\*\*

Caran te dibînim dilek

### Anahîta

### HESTEN JI DAMAREN XABUR

Ken li girî dicivîne  
 Caran te dibînim riyek  
 Tid dimeşim tali nîne \*\*\*

Caran te dibînim şevek  
 Hêza mûmê direvîne  
 Caran te dibînim revêk  
 Tîhna tîrsa min dişkîne \*\*\*

Caran te dibînim kîfek  
 Ken li lêvan radixîne  
 Caran te dibînim êşek  
 Xwe di can de vedzelîne \*\*\*

Caran te dibînim peyvek  
 Bêdengiyê dicirîne  
 Caran xewnek caran dîwek  
 Caran dil tew te nabîne

### Tûrik

Qereçiyen dilê min li delavîn çavêne danîn  
 Dema babelîskên te rabûn  
 Tûrik bi ser ketin û pirsek parsek  
 Li şûn wara ma

### Çi şevek

Çi şevek tarî û xemgîn  
 Eşê di dil de diçîne  
 Qeb-qaba kewen dilê min



Sazê dûrbûnê dixwîne  
 ####

Bi keser û bi hêşiran  
 Dil nama te dinivsîne  
 Bi kûrbûna birînê xwe  
 Hestê xwe werdigerîne  
 ####

Caran  
 Caran te dibînim gulek  
 Jiyana min dixemline  
 Caran te dibînim dînek  
 Hêviyên min bi cî tîne \*\*\*

Caran te dibînim dilek

### Roye

Dîsa sibehbû ...Royê şaxê xwe berdabû hemû xaniyan û tîrîjên xwe berdabû nave porê qamişlokê û qamişloka rengîn giran....giran bawesînkên xewê ji çavê xwe dadweşîne û devê wê kenek sermedî li ser lêvan radixîne

Germ bû ...lê zarok germbûnê nîzanîn  
 Hin li taxê dilizin...hin di hundîrê hewşan dene û hin hîn bawesînkên xewê têne wan

Her kes bi xwe mijûle....yê kincen xwe li xwe dikin....yê taştî dixwin ...yê çûne nan...yê tê ..yê dehrin ...jiyanek zindî berdewame

Roye û bawerî bi Royê hatibû Jî nişkave û weke tabloyek bervajî bibe. Wilo jiyan hate guhertin

Gelo raste yan heneke

**Helbesta kilasîk û ya nûjen ji dinivise û gelek helbesten wê bi rengê sitraran tê.**

**Dî hînek kovaran de û bi herdu ziman-n nivîsandin wek "Zanîn, Zevî, Rojda , Sor gul, El Mewa-sim, Zingil ,Babîsok".**

**dîwana wê a helbes-tan di sala 2002an de bi navê (Hesten ji Damaren Xabûr) ew jî ji weşanen zevî bû,**

**niha pirtûkek din heye dîbin çapê deyê lê bi zimanê Erebî ye ew jî helbestin.**

**Di sala (2006-2013)**  
**dûrî nivîsandinê ket, lê di şoreşa Rojava de dîsa vegeziya, lê vê carê ne tenê helbest bû, hînek gotar jî nivîsand, lê gotarên bûyeran bû, li alîskî din çîrokên filiklorî yê li ser ziman mayî, û niha hazîra pirtûka wê dike, li kîleka wê projak bi navê (Jin di şoreşa Rojava de) di nav destê wê de ye.**

Le çîma laşê Qamişlokê dile-rize û ken.  
 Ü kenê wê çîma bû girî bû xwîn û li ser dêmê wê diherike Raste yan heneke

Le ew ci denge ji bin dîwaran tê  
 Ew ci kese nîv laşê zarokekê rakirye

Bay di orta hewş û taxê de heyirî ye  
 Dayik dilê wê ji xwînê miçiqî ye

Hêşir bê sîdye..ziman bê sîdye  
 Her tişt di wê rejê de bê sîdye bû

Tenê felsefa mirinê xwe pînase kiribû  
 Qe kes bi xwe ne ket şik û gûmanan

Qe zingîlê qederê di guhê kesekî de lêneketibû Robû û bawerî bi Royê hatibû

Ü berê digotin Pişti tengayê ferehiye

Pişti tariyê ronahî ye  
 Lê çîma Roya me bi mij û dûman bû bi xwîn û qêrîn bû Gelo Ro ji hatibû xapan din û Qamişloka delalî bi xwere mat mayî kir

Erê,erê  
 Lê Qamişlo sekîni ma û wê her sekîni bîmîne

Qamişlo sembla jiyanê ye û pakrewanen wê ...wê bibin Ronak..bibin tîrêj ji tîrêj Royê û hîn û hîn bawerî bi Royê xortir bike